



Şoreşa anarşîst ya Îspanyayê-I

• **Viyan POCH**

Rewşa Îspanyayê ya berî Şerê Navxweyî a di sala 1860-1936'an; bi giştî ev dem, dema qeyrana aborî û siyasî bû. Pergala desthilatdar gelek caran guherî: Feodalîzm, qralbûn, rejîma diktatorî, komar hatin avakirin. Lê, rewşa karker û gelên bindest her tim wek xwe ma: Birçibûn, kedxwarî û perîşantî nesibê gelên bindest bû. Ev rewş jî ji bo karkeran yek ji sedema bingehîn a têkoşîn û serhildanê bû.

Li Îspanyayê fikra şoreşgerî

Dema şoreşa civakî li Îspanyayê destpêkir, feraseta anarşîst di qadên çalak û bîrdozi de nêzî sedsalekê bû ku hatibû praktik kirin. Yek ji van mînakên jî ya 8 anarşîstên ku piştî serhildana karkeran ya di 1'ê Gulana 1886'an de li Şikago hatin îdamkirin, an jî şoreşa anarşîst 'Makhnovichina' ku li Ukranyayê di sala 1917'an de li hemberî pergala heyî têkoşîn kir û gundê li ser bingehê anarşîzm û xweseriyê rêxistin kir, bi nav û deng in. Bîrdoziya anarşîst ne pergaleke, berovajî xwedî ramanên bingehîn yê jî bo avakirina civakek xweser û azad e, li hemberî hemû cûre desthilatdarî û serdestiyê ye, ji bo xwe birêxistinîkirina civakek cûda ji pergala dewletê navendî ye. Li ser van bingehên, şoreşger û rêxistinên anarşîst xwe li gor rastiya civakê heya birêxistin û îlan dikin.

Ramanên şoreşgerî li Ewropayê jî aliyê Civîna Navnetewî ya Karkeran ve hatibû belavkirin. Di nava salên 1868-1872'an de Civîna Navnetewî ya Yekemîn hat lidarxistin. Di vî civînê de du xetên bingehîn hebûn: Anarşîzm û komunîzm. Temsîlê anarşîzmê Bakunî û yê komunîzmê jî Marx bû. Di navbera van du bîrdoziyan de gelek nîqaş hatin pêxistin, ferq û cûdatiyên wan danîn holê. Her du bîrdoziyan jî tunekirina pergala hilberinê ya kapitalîst armanc dikirin. Lêbelê cûdatiya bingehîn ew bû ku avakirina dewletê armanc nedikirin. Bi giştî, armanca Karl Marx avakirina civakek sosyalîst bû ji bo wê, li gorî nêrîna wî, avakirina dewletek diktator a proleter û partiya komunîst ya yekta pêwîst bû. Armanca Bakunî jî avakirina civakek sosyalîst ya kolektîf bû. Ji ber vê, li gorî nêrîna Bakunî hilweşandina dewletan pêwîst dikir. Pergala Bakunî, pergala federal a azad ya koperatîf bû û wî diyar kir ku ji bo şoreş were kirin, diviyabû dewlet ji holê bê rakirin.

Têkoşîna li dijî pergala kapitalîst

Dahûrînen Bakunî yê li ser anarşîzmê bi taybetî li Swîsra, Îtalya, Fransa û Îspanyayê di nav van salan de belav bû. Li Îspanyayê piraniya karkeran xeta Bakunî ya anarşîst dişopand û piraniya wan karkeran cotkar bûn. Kapitalîzma Îndustrial li Îspanyayê dest pê kiribû, lê karkerên avahiyê kêm bûn. Ji xwe karkerên cotkariyê bi giştî fêrî jiyana komînal û kolektîf bûn û berî bi dehan salan jî serî hildidan. Cotkar mînakê bûn ji bo hemû karkeran û lewma pêwendiyên di navbera karkerên bajarî (avahî) û karkerên gundî (cotkar) de pirr xurt bû.

Di sala 1910'an de, li Îspanyayê rêxistina anarşîst ya CNT ('Confederacion Nacional de Trabajadores', Konfederasyona Netewî ya Karkeran) hat avakirin. CNT'ê bi giştî di qada karî de xebat dikir, ji xwe jî sendikayên karkeran yê anarşîst pêk dihat. Di van salan de, CNT yek ji rêxistina herî mezin a karkeran bû û piraniya karkeran tevî ramanên anarşîst ya kolektîvist dibûn (nîzê du milyona endamên CNT'ê hebûn). Bandora CNT'ê pirr xurt bû, bi taybetî li herêmên wekî Madrîd û Katalûnya ku navendên aboriyê yê Îspanyayê bûn, mirov ev yekahî hîn baştir didît. CNT'ê jî bo pergala 'Komunîzma Anarşîst', xweseriyê karkeran û li dijî patronan û pergala hilberinê ya kapitalîzmê têkoşîn dikir. Amûrên ku ji bo têkoşînê bikar tanîn: propaganda, sabotaj û pêxistinî serhildanan. Wan jî têkoşîna parlamentariyê bawer nedikir, ji ber vê yekê jî rêxistina CNT'ê di her firsendê de li dijî hilbijartinan derdiket û banga sabotajê dikir.

CNT rêxistina qadroyan bû. Çar ji van qadroyên CNT'ê bi nav û deng bûn: 'Buenaventura Durruti', 'Francisco Ascaso', 'Garcia Oliver' û 'Federica Montseny'. Di sala 1927'an de rêxistina FAI ('Federacion Anarquista Iberica', Federasyona Anarşîst ya Îberya) hat îlan kirin. FAI rêxistinek veşartî û milê çekdarî û ideolojîk yê CNT'ê bû. Rêbazê xwe yê têkoşînê jî rama-

nên şoreşgerî anarşîst yê bi navê 'Errico Malatesta' digirt. FAI di her firsendê de li gelek gund û herêman, li dijî hêzên polîsan çalakî didan destpêkirin, serhildan birêxistin dikirin. Gelek caran serhildanên wan serkeftî bûn, ji bo demekê be jî pergala 'Komunîzma Anarşîst' di wan deveran de îlan dikirin. Ev serhildan jî ji aliyê dewleta Îspanyayê ve bi zîlm û tundiyê hatin çawisandin.

'Komunîzma Anarşîst', pergala civakî ya anarşîst bû ku ji aliyê CNT-FAI ve hat pêşniyarkirin û pêxistin. Armanca pergala rêxistinîkirina civakek azad, bê hiyeraşî û xweser bû. Bingeha pergala hilweşandina dewlet û avakirina konfederasyona komunan bû. Di van komunên xweser de sermayeyên kapitalîst hatin qedexa kirin û xebat li gorî berjewendiyên kapitalîst nebû; endamên komunan li ser esasê berjewendiyên komunal dixebitîn. Hemû birokrasiya dewletê ji holê hat rakirin û endamên komunan xwe li gorî pêdiviyên civakî birêxistin dikirin. Yek ji qada ku herê zêde pêwîstî pê dihat ku xwe tê de birêxistin bikin jî qada perwerde, tendurîstî û ewlehiyê bû. Bi taybetî vî pergala hişt ku pergala dadê ya dewletê ji holê bê rakirin. Çareseriyê pirsgirêkên komun û civakê di destê endamê wan de bû û bingehê pergala nû li ser piştevanî û piştgirîdayîna civakê bû. Li hemberî pergala navendî, pergala 'Komunîzma Anarşîst' di hemû herêm û komun, meclîs û civînan de hat îlan kirin. Berpîşyariya parastina komunan girêdayî endamên komunan an jî 'Komîteyên Parastinê' bû. Ev komîte, komên çekdarî bûn ku ne tenê tax û komun diparastin, gelek serhildan jî dan destpêkirin.

Dem dema şoreşê bû

Di sala 1934'an de serhildaneke pirr mezin û girîng a karkeran hat destpê kirin. Navê serhildanê 'Serhildana Cotmeha 1934'an' bû. Karker û şoreşgerên anarşîst li bajarên wek Zaragoza, Barcelona û bi taybetî jî li herêma Asturiyas rabûn ser piyan û pêla serhildanan dest pê kir. Li Asturiyasê piraniya karkerên cotkarî û komirê hebûn û li dijî kedxwarî û rewşa xwe ya xirab têkoşîn dikirin. Ev serhildan 2 hefteyan dirêj kir û ji aliyê artêşa Îspanyayê ve hate tepisandin. Encama operasyonên qirkirinê wiha bû: 13.000 kes hatin qetilkirin û 30.000 kes jî hatin girtin. Di wê demê de hikumeta Îspanyayê komarek 'sosyalîst' bû.

Ev encam li gorî berjewendiyên siyasî yê partiya nû ya çep 'Frente Popular' (Eniya Gel) hat bikaranîn. Di Sibata sala 1936'an de hilbijartina hikumetê hebû û vî partiyeke da destnîşan kirin ku ger ew di hilbijartinê de serbikevin, ew ê girtiyên serhildana Cotmeha 1934'an berdin. Ji bo şoreş û tevgera karkeran berdana bi hezarî hevalan tişteke pirr girîng bû. Û bi vî rengî partiya 'Frente Popular' di hilbijartina Sibata 1936'an de bi serket. Tevgera şoreşger wiha difikirî ku bi serkeftina partiyeke çep re wê şert û merc ji bo şoreşê guncaw bibin. Dem dema şoreşê bû. Ji ber vê çendê jî karkeran çalakîyên xwe mezintir kir: Dest ji kar berdan, li dijî dagirkerên axa xwe ku gav bi gav erdê wan dişilandin, derdiketin. Di heman demê de, dema partiya 'Frente Popular' serket, rêxistina faşîst ya 'Falange Española' hemlayek li dijî zêdekirina tevgera karker û şoreşgeran da destpêkirin. Têkoşîna çekdarî li kolanan, di navbera faşîst û tevgera çep de hat destpê kirin û gelek karker û şoreşger hatin qetilkirin.

Di wan salan de rola ol û dêra katolîk pirr girîng bû. Bi sekna xwe didan diyar kirin ku li gel kapitalîst, faşîst û desthilatdaranin. Kevneşopîya ola katolîk li Îspanyayê her tim wisa bû. Ji bo mirovên bindest pirr eşkere diyar bû ku dêra katolîk wekî rêxistîneke desthilatdar û bawîksalarî ye ku ji rewşa gel a perîşantiyê sîd verdigirt. Ji aliyê karker û bi taybetî jî anarşîstan gelek caran çalakîyên li dijî simbolên dêra katolîk hatin meşandin. Bi giştî hemwelatiyên Îspanyayê ji ola katolîk bawer nedikirin û dêra katolîk di rewşa qeyrana kûr de dibohirand. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku bandora bîrdoziya şoreşgerî her wekî anarşîzm û komunîzmê pirr xurt bû. Ji ber rewşa domdar ya xêzanî û kedxwariyê, têkoşîna li dijî pergala dewletê gelek bi hêz bû. Tevgera karker û şoreşger, bi taybetî tevgera anarşîst ji bo şoreşê jî her demê zêdetir amade bû. Di aliyê din de jî çete, faşîst, bûrjûwazî, netewperest û olperest, nekarîn ve rewşa heyî bipejirînin û hêdî hêdî binhega darbeya leşkerî ya faşîst hat afirandin.

Şoreşa Civakî (1936-1939)

Komek di nav artêşa Îspanyayê de, di 17 Tîrmeha sala 1936'an de darbeya faşîst pêk anîn. Darbe ji aliyê general 'Francisco Franco' ve hatibû amade kirin. Di darbeyê de çeteyên girêdayî artêşê hatin bikaranîn û ev darbe hema bêje li her deverê, ji Îspanyayê wêdetir belav bû. Lê, general Franco tiştê ku armanc dikir bi dest nexist, ji ber ku berxwedana gelên Îspanyayê a li dijî darbeyê gelek bi hêz bû. Bi taybetî, li herêm û li bajarên ku tevgera karkeran mezin bû, faşîst serneketin. Ji ber vê, di roja 21 Tîrmehê de bera şer diyar bû û şerê navxweyî û şoreşa civakî dest pê kir. Navendên berxwedanê bajarên wek Madrîd û Barcelona bûn. Barcelona paytexta şoreşê bû.

Di 18 Tîrmeha 1936'an de rêxistina anarşîst ya CNT-FAI kontrola bajarê Barcelona girt dest xwe. Li Barcelonayê di 19'ê Tîrmehê de Şoreşa Civakî hat ragihandin û bajar li gorî pergala 'Komunîzma Anarşîst' xwe birêxistin kir. Baregehên artêşa Îspanyayê jî dest wan hat girtin, çekên heyî hatin îmze kirin û li ser gel hat belav kirin. Ev baregehên artêşê û ofîsên hikumetê wekî baregehên şoreşê hatin bikaranîn. Taxên bajêr li gorî jiyana komunal tê birêxistin kirin, hemû qadên civakî yê wek qada aborî, pergala trê û otobusan, çandinî, pergala telefon, ragihandin û hwd. tîk kolektîf kirin. Dêrên katolîk dixin bin xizmeta gel an jî bi temamî tîk şewitandin. Ji ber ku dema darbe destpê dîke, dêra katolîk yek ser li şona cem gel ref girê bide, li gel faşîstan disekine û olperestan ji dêran êrîş dibirin ser gel, li hemberî gel çek bikartanin. Jiyan di komunan de pirr baş hatibû birêxistin kirin. Av û kerebe ji bo hemû mirovan bê pere bû. Di navbera 2 mehan de hat dîtin ku pergala komunal bi her awayî ji pergala heyî a kapitalîst baştir e. Ev rêbaz û pergala 'Komunîzma Anarşîst' jî aliyê CNT-FAI ve li herêmên wek 'Aragon', 'Catalunya', 'Castilla' û 'Valencia' hat pêşde birin.

Dengê şoreşa mezin

Ji bajarên anarşîst yê wek 'Barcelona' û 'Valencia' taburên çekdarî (milicias) yê jî bo parastina şoreşê ku bikaribin li dijî faşîzmê têbikoşin, hatin avakirin. Di 21 Tîrmeha sala 1936'an de Tabura 'Columna Durruti' derbazî bera şer a Aragon bû daku bikaribe bajarê Zaragoza rizgar bike. Ji Valensîa yê Tabura Hesiñî (Columna de Hierro) jî çû qada şer. Ev tabur pirr balkêş bû, balkêş bûna ve taburê jî ew bû ku yê tê de cih digirtin berê hemû girtî bûn. Di dema şoreşê de komên anarşîst çûn girtigehan û girtî berdan. Pişt re gelek ji wan girtiyan tevî bîrdoziya anarşîst û têkoşîna çekdarî bûn.

Cepheya Aragon, cepheya herî girîng ya şer bû. Li wir taburên anarşîst yê CNT-FAI û taburên UGT û POUM'ê li dijî komên faşîst şer dikirin. Serokê CNT'ê, 'Buenaventura Durruti', tabura şer de cih digirt, di vî berê de şer dikir. Ew agahî digirin ku pêwîstiya bajarê Madrîdê bi alikariyê heye. Durûtî serkeftina bajarê Madrîdê pirr girîng dibû û biryar dide tabura xwe bibe Madrîdê. Li wir di roja 20 Mijdara sala 1936'an de şehîd dikeve.

Di Îlona sala 1936'an de partiya komarê, 'Frente Popular' li gel partiya komunîst ya Îspanya yê (PCE) biryara sînodar kirina xebatên li ser şoreşa civakî dide. Çima? Ji ber ku tevgera şoreşgerî dît ku di nav şert û mercên şer de jî pêdivî bi pêxistinî xebatên şoreşê heye û hewceye pergala komunal bê îlan kirin. Armanca partiyan komarê û PCE'ê parastina dewleta bûrjûva a komarê bû.

Di destpêka şoreşê de gelek taburên xweser ji aliyê rêxistinên şoreşgerî ve hatin damezirandin. Hêz di destê gel de bû. Di van taburan de hiyeraşî nînbû û sedema serkeftina cîhaneke azad bingehê vîna her yek jî endamên vî taburê bû. Dema di Îlona 1936'an de ji aliyê hikumetê û partiya PCE'ê 'Komîteya Navendî ya Taburan' hat damezirandin, ev xweserî jî ji holê hat rakirin û hêz jî destê gel hat girtin. Rêveberên rêxistina CNT'ê 'Garcia Oliver' û 'Federica Montseny' tevî vî komîteyê bûn û dovre li ser beştarbûna CNT'ê a di nav hikumetê de li hev kirin. Ligor CNT'ê sedema ve yekê binketina faşîzm û berfireh kirina rêxistina wan bû. Lê, li gorî şoreşgeran ev ne sedemeke di cih de bû. Rêveberiya CNT'ê îxanet li şoreşê kir, wan şoreş firot. Pişt re di meha Kanûna 1936'an de, hikumeta komarê li gel PCE û CNT'ê xwe paşde kêşan û hîştin ku taburên xweser di nav artêşa fermî de bê helandin. Ev yek jî bû destpêka bidawî hatina şoreşê.

